# Rêber li bijîşkên zarok û ciwanên li bonn ê



**Bi xêr hatî**

Rêber li bijîşkên zarok û ciwanan ji bo Malbatên bi zarok û ciwanan di navberî 0–18 salan de ji dest hatin, yên ku ji lênerîna ilacê zêdetir hewcedar in.

Ev pêşniyar bi dilxwazî ye, ne girêdayî ye û bê pere ye ji bo malbatan re. Danûstandinên bi awayekî veşartî ne û li gorî nepenîtiyê pêk tên.

Navê min Sandra Rommelfanger. Ez bi destûrname karkerê civakî di komeleya Xêrxwazî li bajarê Bonn ê ( Bonner Caritasverband ) karmend im.

Ez her du hefteyan carekê têm alîkarî li bijîşkên zarok û ciwanan û demjimêrek şêwirmendiyê pêşkêşî dikim.

Ez nêzîkî saetekê digirim da ku ez bi we re fikar û pirsên we bipeyivim. Ez alîkariya we dikim ku hûn ramanên baş pêş bixin, ka kîjan pêşniyar li Bonnê ji we û malbata we re herî baş bin.

Li ser çi hûn dikarin bi rêberê re biaxivin? Pirs û Pirsgirêkên malbatê cûda ne, wek mînak:

- Hûn hîn jî ji bo zarokê xwe li Kîndergarten cîhek digerin û li vir pirsên we hene.
- An jî hûn bi tenduristî an giraniya zarokê xwe difikirin? Çiqas Xwarin ji Zarokê min re baş e û çi ji bo Tenduristiya wê/wî girîng e.
- Pirsên we ser dema ekranê hene: Çiqas dem li ber TV, Telefonê an jî konsolê Lîstikê bi rastî ji bo Zarokê min baş e? Kengî zirarê dide Pêşveçûna Zarokê min?
- Hûn bi fikar in ku Zarokê we li dibistanê baş pêş dikeve, an jî hevalên Zarokê we heye yan na û bi Hevalên xwe yên polê re bi hevdu re baş in.
- Hûn dibînîn ku zarokê we di rewşekê gelek giran de ye û hûn nizanîn çawa alîkariya wê/wî bikin: wek mînak: bandora pandemiyê, zordarî, rewşên zextê yên malbatê, wek veqetandina dê û bavan an jî windabûna kesekî nêzîk.
- Hûn ji bo zarokê xwe li çalakiyek dema vala ya minasib digerin da ku ew têra xwe werzîşê bike.





- Hûn carna betilî ne û pirsên we li ser mijara perwerdehiyê hene.

- Hûn carna betilî ne û pirsên we ser mijarê talîmê hene.

- Hûn li ser pêşveçûna zarokê xwe meraq dikin. Dibe ku zarokê we di pêşketina ziman an jî di warên din ên pêşketinê de zehmetî hebe û hewceyî alîkariya dermankirinê be, wek pêşketin, axaftin, terapiya kar an jî fîzîkoterapî.

- Hûn dê û bavê kesekî nexweş an jî hewcedarê lênêrînê ne. Ji bo ku hûn pirsên li ser Derfetên piştgirî û pêşniyarên alîkariyê.

- Hûn dê an jî bavêk bi tenê ne û li pey pêşekêş ji bo malbatên tenê digerin. Dibe ku pirsgirêkek din hebe û hin caran jî bi guhdarîkirina kesek alîkar dibe.

Ez malbatên ku zimanê Almanî kêm dizanin jî şîret dikim û alîkariya wan dikim ku pergala tenduristî û civakî ya Almanî baştir fêm bikin. Hin caran jî ji bo ku herkes bikaribe bi hev re baştir têbigihêjin hevpeyvînê, kesekî din jî têxe nav hevpeyvînê.

Heke hûn jî xema xwe an jî pirsên we yên der barê nexweşiyê de hebin, hûn dikarin bi doktor an jî karmendên tenduristiyê re bipeyivin û ji bo hevdîtineke pêşîn bi hev re hevdîtinê bikin. Ger demjimêrê hevdîtinê ne bes be, hûn dikarin bi telefonê, li mala xwe an jî li ofîsa Caritasê hevdîtinên din pêk bînin.

Rêber li pisporên zarokan û xortan ji hêla “Kinderstark NRW derfetên xwe çêdike” û bajarê Bonnê ve tê fînansekirin û di nav navenda koordînasyonê de ye.

Alîkariya Bonn – Tora ji bo bav, dayik, zarok’ bi cih kirin. Saziyên koordînasyonê Familenkreis e.V. û Caritasverband ji bo bajarê Bonnê e.V ne.